

Îran Celadê Zarokan

Hemîd Muxtarî

Îsal di demekê de Roja Cîhanî a Xebat li Dijî Îdamê di seranserê cîhanê de hat bibîranîn ku bi hezaran kes li Îran û çend welatên din bi cezayê îdamî hatine mehkûmkirin û li benda birêveçûna biryara mirina xwe ne. Rejîma Îranê tenê rojekê piştî 10 Çiriya Pêşîn, anku Roja Cîhanî a Xebat li Dijî Îdamê, û 3 rojan beriya Roja Cîhanî a Zarokan li Îranê anku 8'ê Çiriya Pêşîn a îsal, Bêhnûd Şucayî, darvekir. Kiryarek ku tenê rûreşî bo Îranê bi cih hêla û bû sebebê bêzariya zêdetir a raya giştî ya cîhanê ji wê rejîmê. Bêhnûd Şucayî di 28 Gelawêja sala 1384'an a Rojî di pevçûnekê de li parka Venek a Tehranê di temenê 17 saliyê de, nûciwanekî bi derba kêran kuştibû. Navbirî piştî hat girtin û ji aliyê dadgehê ve bi cezayê îdamê mehkûm bû. Herçend ku çendîn welat, komele û rêxistinên mafê mirovan hem li navxwe û hem li derveyî welat û heta Yekîtiya Ewrûpayê jî bi rêvebirina kampanya înzayan û derkirina daxuyaniyan daxwaz ji Îranê kirin ku Bêhnûd Şucayî, îdam neke, lê rejîma Îranê bê guhdan bi raya giştî a cîhanê û zext û givaşên navnetewî, roja 11'ê Cotmeha 2009'an, navbirî darvekir. Îrorojê di asta cîhanê de, seba ew hewl û cehdên saziyên parastina mafê mirovan, nemaze Rêxistina Lêborîna Navnetewî bona rêzgirtina zêdetir ji mafê mirovan, hejmara ew welatên ku biryara îdamê bi fermî betal kirine û hilweşandine, gihîştîye 94 welatan. Bi taybetî li kêleka me anku li welatên Turkiye, Ozbekistan û Tacîkistanê.

Îran di pileya duyem a îdamkirinê di cîhanê de ye.

Hêjayî gotinê ye ku di nava wan 58 welatên ku hêj biryara îdamê betal nekirine û birêve dibin, ji sedî 93 di jî, Îran Çîn di pileya yekem de ye.

Herçend ku rejîma Îranê di sala 1994'an de Carnameya Mafê Zarokan îmza kir û li gor madeya 37 a Peymannameya Mafê Zarokan ku dibêje: "Nabe tu zarokek were îşkencekirin yan rastî riftar û kiryarên nemirovane bê, herwiha nabe biryara darvekirinê yan hepsa heta hetayî bê hebûna azadiyê, bo zarokên jêr temen 18 saliyê ku sûçê encam didin, were derkirin, dîsan em dibînin ku rejîma Îranê her ji sala 1994'an heya niha ku nêzîkê 15 salan e, derdora 100 zarokên jêr temenê 18 saliyê li Îranê îdam kiriye û bo pitir jî 200 zarokên din biryara îdamê der kiriye Her di vê derbarê de, Saziya Efûya Navnetewî

vê dawiyê daxuyaniyek belav kir û rejîma Îranê wek celadê zarokan da nasandin. Herwiha navendên mafê mirovan li Îranê wek Saziya Parastina Mafê Mirovan li Kurdistanê, Çalakên Îranî ên Parêzerê Mafê Mirovan li Ewrûpa û Amerîkaya Bakûr, Komîteya Parêzerê Girtiyên Siyasî û Komîteya Nûçegihanên Mafê Mirovan û wd..., bi hinceta 10'ê Çiriya Pêşîn a 2009'an, Roja Cîhanî a Xebat li Dijî Îdamê, raporên xwe derheq rewşa darvekirinê bi awayê jêrîn bo raya giştî eşkere kirin: Ji Çiriya Pêşîn a 2008'an heya Îlona 2009'an, biryara îdamkirina 339 kesan li Îranê birêve çûye ku li gor sala borî, 53 kes zêde kiriye. Di nava wan 339 kesan de, 3 kes bi hovanetirîn awayî anku kevirbarankirinê hatine kuştin. 32 kes ji wan îdambûyan, girtiyên siyasî û ramanê bûn. 10 kes jin bûn. Di nava 120 kes ji îdambûyan de ku temenê wan di wê raporê de hatiye, 6 kes li jêr temenê 20 saliyê de bûn. Herwiha her di wê midehê de ku ev rapor hatiye amadekirin, biryara îdamkirinê ji bo 303 kesên din jî hatiye derkirin ku 20 kes ji wan girtiyên siyasî û ramanê ne. 12 kes ji wan bi cezayê kevirbarankirinê hatine mehkûmkirin û 30 kes jî jin in. Temenê 16

D.R (4)